Rengên têkiliya nava civakê wê hebê. Têkiliya nava kesan, koman, herêman û beşên civakê û hwd wê hebê. Ev rengên têkiliyî wê temenê wê hertimî wê bi fahmkirinê wê aqil wê biafirênê. Mirov dema ku ew gihişt aqil û bi aqil bû û weke temenê wê xêva mirov afirî ew xêva mirovî wê weke xêva civakî jî wê di dîmenekê de wê di wê rengê û awayê de wê, kar û erkekê wê bi xwe re wê werênê li cih.

Di wê çerçoveyê de wê dema ku mirov ji wê aliyê ve hebûna civakê wê werênê ser ziman wê, di aslê xwe de wê, civak wê, xwediyê xêvak zindî a mirovî bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê dikarê wê werênê ser ziman. Lê aliyekê din ê bi dîmenî ku em bi pêvajoyên aqil, çand û dîrokê û hwd re wê, werênina ser ziman jî wê ew jî wê bi pêvajoyên pêşketinê re wê bi fêr û azmûnên me yên jîyanî ên ku ew bûna re wê xwe bide nîşandin. Di nava civakê de hemû vegotinên weke bi çîrokî û hwd wê, aliyekê wan ê bi wê rengê wê hebê ku mirov di serî de wê weke aliyekê giring wê dikarê wê werênê ser ziman.

Ji aliyê xêva civakî û awayên wê yên weke bi dîrokê, çandê, rengên aqil û hwd re ku mirov wê werênê ser ziman wê temenê wan jî wê li ser rûdayîn û pêkhatinên bi jîyane mirov, civakê û hwd re wê temenê xwe bide çêkirin. Di dewama wê de wê ev rewş wê dema ku ew bûn wê, bi awayê ku ew bûn re wê xwediyê awayekê fahmkirinê ê bi çerçoveyî û darêjkî bin. Wê ew jî wê temenekê fahmkirinê ê civakî bi wê rengê wê biafirênê. Di aslê xwe de wê temenê xêva xêva civakê wê di wê rengê û awayê de wê, di serî de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman. di nava rûpelên dîrokê de kifşkirina rewşek rûdayî û fahmkirina wê temenê wê, şertûmercên wê yên demkî û hwd wê di wê warê de wê têgihiştinekê wê bide me.

Di wê warê de wê temenê bi danîna têkiliyan a navaroka civakê wê weke temenekê ku em di wê çerçoveyê de wê weke temenekê heyînî û bi heyînî wê werênê ser ziman bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê minaq hişmendiya bi têkiliyekê re wê, dema ku ew dibê ku em di farqê de bin û ne di farqê de bin wê bi wê xêva civakî re wê xwediyê temenekê bê. Wê ew rehetîya nava civakê a bi derûnî ku ew bi mirov re çêdibê wê di temenê wê de jî wê ew wê hebê.

Dînamika civakî û dîrok

Ku mirov ji kîjan aliyê ve wê hilde li dest wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê dîrok û civak wê têtikiliyek wan a kûr wê bi hevdû re wê hebê. Civak wê temenê xwe wê ni mejuya xwe re wê bide çêkirin. Wê di pêvajoyên xwe yên pêşketinê de wê, ji dîrokê û serborîyên xwe yên berê wê, sîdwergerê. Wê ji wan wê encaman wê derxê. Wê bi wan bigihê pêşketinên nû. Wê di dewama wê de wê, pêvajoyên pêşketinê û gûharînê wê bi xwe re wê bide çêkirin. Ku mirov ji kîjan aliyê ve hilde li dest wê civak wê weke temenek dîmanekî wê, hertimî wê di pêvajoyek pêşketinê a dayimî de bê. Wê, di wê warê de wê, pêvajoyên pêşketinê wê bi xwe re wê ni xosletên demê re wê bijî.

Di nava rûpelên dîrokê de wê, çi jîya bê ku ew di farqê de bê û ne di farqê de jî bê wê, bandûra wê li pêşketina wê ji temen ve wê hebê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê ser ziman.

Pêvajoyên pêşketina civakê wê, di wê çerçoveyê de wê hertimî wê sê aliyên wê yên bi fahmkirinê wê hebin. Aliyek wê demên wê yê bûhûrî bê. Aliyê duyem wê dema ku ew di wê dijî bê. Aliyê sêyem jî wê, pêvajoyên ku ew bi ber pêşarjê ve dijî bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, bi gelek fektorên ku ew di nava wê de bandûrê li wê dikin re wê ew wê were ser ziman.

Di wê çerçoveyê de wê mirov diakrê wê, werênê ser ziman ku wê pêvajoyên pêşketina civakê wê, di wê çerçoveyê de wê, xwe bi awayekê wê bide dîyarkirin. Di mijare fahmkirina pêvajoyên pêşketina civakê de wê, li ser temenê wê bibin wê ew jî wê weke aliyna giring ên ku em wan di serî de fahmbikin bin.

Di wê çerçoveyê de wê têtikiliya ardnigariyê, civakê, demê û dîrokê wê bi hevdû re wê di çerçoveya pêvajoyên pêşketinê de wê hebê. Wê, di nava wê pêvajoya pêşketinê de jî wê civak wê bi endamên xwe re wê weke dînamika ku ew temenê wê diafirênê bê.

Di dewama wê de wê, civak wê bi wê rengê wê pêvajoyên wê yên ku ew bi demê re wê bîn jîyankirin wê ew wê hebin. Di aslê xwe de wê mirov dikarê wê weke aliyekê giring wê werênê ser ziman ku wê civak wê, hertimî wê weke aliyekê giring wê, di wê çerçoveyê de wê pêşketina wê bibê. Dînamisma civakî wê, di wê çerçoveyê de wê ji aliyekê ve jî wê pêwîstîya fahmkirina wê bi çand, ziman û aliyên wê yên din re wê hebê. Ber ku ew dînamism wê pêşketina xwe weke ku ew dixwezê çêbikê ev rêyên wê yên têtihîştinê wê pêwîstîya têrzanîna wan a jî wê re wê hebê.

Di wê rewşê de wê, mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê fahmkirina dînamisma civakê wê, di aslê xwe de wê weke mijareka giring a civakî bê. Wê, dînamisma civakî wê mirov nikarê wê ji rêzê wê bihasibênê wê werênê ser ziman. Divê ku mirov wê bi kûrahiya fahmkirina dîroka civakê, çand û zimanê re wê bi temen bikê û wê fahmbikê. Wê hingê wê civak wê pêşketineka weke ku ew pêwîsta wê bi xwe re wê bijî.

Civak wê, di her demê de wê hebê. Lê di her demê de wê darêjkên (formên) civakî ên cûda wê pêşkevin û wê biafirin. Wê di wê çerçoveyê wê dema ku mirov li demên berê ên dîrokê dinerê wê di wê çerçoveyê de wê mirov dibînê. Wê di demên pêşarojê de jî wê, bi wê rengê wê pêşketinên civakî wê bi darêjkên civakî wê, biafirin û wê bibin.

Di wê çerçoveyê de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê dînamisma civakî wê, bi temenê vejene civakî wê di pêvajoyên dîrokê de wê di dema xwe de wê di nava herîkînekê de bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê pêşketina xwe wê bijî. Di wê rewşê de wê, dîroka civakê wê, di wê temenê wê de wê temenê wê yê fahmkirinê wê bi wê re wê, biafirênê.

Mirov têgîna dînamismê bi her civakê û pêvajoyên wê re wê dikarê wê werênê ser ziman. Ev dînamism wê reng û awayê wê yê di pêşketina civakê de wê rêyên pêşketinê ên ku ew bi wê diafirin weke rêyên danûstandinê, têkiliyê û barkirina zanînê û gihandina li her dever û nûqtayên pêşketina civakê wê bi wê re wê temenê wê zêdetirî wê biafirê. Civak wê bi awayekê pirr dîmenî wê di nava pêşketina xwe de bijî. Wê ji aliyê keseyetî ve wê, bi ferdiyete û temenekê ferdiyete dikarê wê fahmbikê. Ji aliyê giştîtiya wê ve jî wê bi wê çerçoveya giştî jîyane komî ve wê dikarê wê werênê ser ziman. Têkilî wê awayekê motorize di pêşketina civakê de wê bileyizin. Mirov dikarê têkiliyên nava civakê bi şibihênê rêyên sînîran ên laşê zindiyekê. Ew rê çî bardikin û radigihênin wê weke aliyekê giring ê ku wê wê bi wê bandûra xwe wê bi civakê wê bide nîşandin. Her barkirin wê civak wê reaksiyona wê li wê bi bertekî wê hebê. Di nava civakê de wê weyna têkiiliyan wê ji wê zêdetirî wê bi awayên wê re wê, wateyên wê hebê. Mirov wê bi ziman wê têkiliyê wê dênê. Emê li jêr di **beşa ziman û civakê** de wê li ser wê bisekin in. Lê li vir bi gotinekê ez wê divê ku wê werênima ser ziman ku wê, rengên salixkirin û fahmkirinê wê di wê çerçoveyê de wê temenê têgihîştin û hişmendiyên din jî wê bi xwe re wê biafirênê. Rengê watelêkirinê wê di wê çerçoveya fahmkirinê wê giringîya wê ji ya ku em dizanin wê zêdetirî wê hebê. Wê, levkirinên bi wateyî wê, ew çerçoveyên fahmkirinê bi

têkiliyî ku ew dihên afirandin wê, bi wê re wê, pêvajoyên wê yên pêşketinê wê temenê wan jî wê bèn çêkirin.

Çerçoveya fahmkirina zanîna dîrokê

Gotina dîrokê wê, weke gotineka ku wê weke ku ew di roja me de jî ew bi wê dihê hanîn li ser ziman wê, serborîyên demên bûhûrî wê werênê li ser ziman. Serborî, weke tişta ku ew hatî jîyankirin di demek bûhûrî de bê. Li vir, ji ya ku ew hatîya jîyankirin wê gotina dîrokê wê hîmê xwe wê bigirê. Wê bi wê re wê were hanîn li ser ziman.

Tiştta ku ew hatîya jîyankirin wê weke ya 'rast' jî mirov dikarê wê di çerçoveya têngîna dîrokê de wê werênê li ser ziman. Lê weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê, piştî ku wê nivîsandin wê pêşbikeve û pê de wê, rewşa nivîsandina dîrokê wê weke mijareka sergirtî û ankû servekirî wê hertimî wê xwe di nava jîyane mirov a bi nivîsandinê re de wê bide dîyarkirin. Di roja me de em, li ser pêşveçûnên zanîne, civakê û hwd re wê dihildina li dest. Her wusa, rêbazên weke lêkolînê, lêgerînê û hwd wê pêşbikevin weke şewayna nivîsandinê. Şewayên nivîsandinê wê di serî de wê, weke rewşa li ser temenê wê yê rast ku ew hertimî li gorî ya ku ew hatî jîyankirin ku ew were hanîn li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd jî wê, weke rewşna ku wê bi wan wê bê xwestin ku wê bi awayekî lêkolînîkî ku ew têkilîya di nava ya hatî jîyankirin û ya ku ew wê dihênê li ser ziman weke hiş bi nivîsê û hwd re wê dênê bê. Li vir, di mantiqê wê bi birhankirina bi rewşa nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd re jî wê, têngîna lêgerîna 'rastiyê' wê hebê. Li vir, ev gotina rastiyê ku mirov wê bahse wê dike em, bi gotinekê jî wê li vir wê bahse wê bikin. Ew jî wê, di wê çerçoveyê de wê, weke hevhevduwîn û ankû lêhetinîyeka weke hevdu ku ew hatîya çêkirin di nava rewşê û nivîsê de wê, di temenê wê gotina rastiyê de bê.

Di rewşa fahmkirina rastiyê de wê, li vir wê, were hanîn li ser ziman. Li vir, çendî ku ew aqil pêş dikeve û pê de wê, hertimî wê zanîna mirov jî wê pêşbikeve. Mirov wê, di rewşa nivîsandinê û hanîna li ser ziman de wê, lêgerîna ku ew bi wê întîbaya gotina 'rastiyê' re wê di çerçoveya dana bawerkirinê de wê bikarbênê. Li vir, dema ku rewş ev bê, wê hingî wê di rewşa têngîna gotina rastiyê a vê rewşê de jî wê hinekî xişiqîn wê bi wê re wê bibê. Yan jî mirov, dikarê bêjê ku wê hinekî şiqitîn wê di wê de wê were çêkirin. Ev jî wê, li vir, wê weke gotineka ku wê dema ku wê ew nivîsandin ku ew hatî nivîsandin wê ji rastiyê zêdetirî wê li rewşa dana bawerkirinê wê were lêgerîn. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, têngîna

gotina rastiyê wê ji rastîya wê dûr wê di vê armancê de wê were bikarhanîn.

Di rewşa fahmkirinê de wê, hertimî ya ku mirov ew fahmkir wê çendî wê karibê ya rast ku ew bûya wê werênê li ser ziman? Ev jî wê weke pîrseka ku mirov wê dikarê wê li vir wê bipirsê bê. Ya ku mirov ew fahmkir wê li vir, wê çendî wê karibê wê ew wê rastîya rast ew di xwe de wê werênê li ser ziman? Li vir, di aslê xwe de wê, pîrsgirêka fahmkirina nivîsên ku ew hatina nivîsandin wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşekê wê hertimî wê gûmaneka ku wê têngîna demê wê di bin wê de wê de wê bi xwe re wê biparêzê. Di rewşa têngîna fahmkirina serborîyên demên bûhûrî de wê, mirov ne xwediyê wê derfetê bê ku mirov di hundûrê demê û cîwarê de wê rêwîtiyê bike û herê wê demê û wê bibînê û bi dîtina xwe re wê êdî wê werênê li ser ziman. Ya ku mirov wê dibînê wê, piştî wê serborîyê re wê bi xiyalkirina bi aqilê mirov re wê li ser zanînen wan deman re bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew wê weke rewşeka hanîna li ser ziman bê. Têgînên weke lêkolîn, lêgerîn û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, ya ku ew hanîna li ser ziman wê di çerçoveyeka bi nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd, wê werênê li ser ziman.

Di rewşên fahmkirina têngîna dîrokê de wê bi demê re wê gelek dîrokên ku wê derkevina li holê wê hebin. Di roja me de wê, têngînên di derbarê dîrokê de ên mengîwerî, pêzawerî û hwd wê, hebin. Ev jî wê, di nava xwe de wê, li gorî têngînên zanînî, bîrdozîkî û hwd wê gelek hizrên di derbarê dîrokê de wê derxê li holê. Minaq, di rewşa têngîna aqilê mengîwerî de ku mirov wê bi wê re wê bihizirê wê rengên têngînên we têngînên di derbarê dîrokê de ên weke metafîzîkî, olî û hwd wê derkevina li pêş. Ev têngîn jî wê weke têngîna ku wê koka wan li ser têngîneka ku wê, bi wê re wê werênina li ser ziman ku wê, her tişt di kifşkirin û dîyarkirina wê de wê, vînek wê hebê. Ew vîn wê weke *'vîna xwûdê'* wê werê hanîn li ser ziman. Ev rengê hanîna li ser ziman a dîrokê wê temenê wê, li ser têngîna baxtê dirûnihê û bi wê re dihê hanîn li ser ziman.

.

ÇAND Û CIVAK

Di aslê xwe de çerçoveya mijare dîrokê û civakê wê berfireht bê. Hê gelek tiştên ku em dikarin di çerçoveya wê de werênina ser ziman wê hebin. Emê dem bi dem û cihbi cih di dewama mijarê de balê bikişênina li ser têngîna dîrokê. Ber ku em kîjan mijarê bi têngîna civakê re wê hildina li dest wê aliyekê wê yê dîrokî wê bi wê re wê hebê û wê pêwîst jî bê ku ew were hanîn ser ziman.

Di wê çerçoveyê de wê dema ku mirov wê werênê ser ziman wê ji aliyên din kevneşopî, orf û adetê û gelek aliyên din ên weke wan re jî wê pêwîstî hatina wê ya ser ziman wê hebê. Di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê di serî de wê werênê ser ziman.

Di nava jîyane civakê de wê weke aliyekê wê yê temenî ê jîyanî wê di aslê xwe de wê têngîna çandê wê derkeve li pêş. Mijare çandê û civakê wê ji gelek aliyên ve wê pêwîstî bi hevdû re fahmkirina wê hebê. Di nava civakê de wê dema ku mirov çandê hilde li dest û wê li gorî rewşan wê gelek salixkirinên wê yên ji hev cûda wê hebin. Di dewama wê de mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê civak bi çanda xwe re wê hebê û wê bi civakî wê karibê bahsa rengê xwe yê jîyanê bikê.

Bi kortasî ku mirov bahsa salixkirina gotina çandê di çerçoveya têngîna civakê de wê bikin wê, di serî de wê, mirov dikarê wê, weke çerçoveya hemû pêvajoyên pêşketinê ên bi jîyanî û dîrokî re wê dikarê wê werênê ser ziman.

Mijare çandê wê mijare fahmkirijna civakê pêşketina wê jî wê ji temen ve wê karibê wê bide dîyarkirin. Wê weke aliyekê civakî ê epistemolojîkî jî bi hebûna civakê re wê mirov dikarê wê werênê ser ziman.

Di wê warê de wê, kesên weke Weber, **Cassirer**, dilthey û hwd wê, weke zaneyna ku wê mijare çandê wê bi çerçoveya herîkîna dîrokê de wê bi têngînek epistemolojîkî û ontolojîkî ku wê hildina li dest û wê werênina ser ziman bin. Di wê warê de wê zanîna wan wê di warê fahmkirina çandê bi awayekê hemdem de wê di roja me de wê weke temenekê jî wê were dîtin.

Çand û civak wê di aslê xwe de wê weke ku em dikarinbi dîrokê re jî wê werênina ser ziman wê du têngînên hevdû afrîner jî bin. Pêvajoyên pêşketina çandê wê heta destpêka dîrokê wê herin. Wê weke Antony

Giddens wê werênê ser ziman wê li ser temenekê bûjenî ku wê mirov dikarê wê fahm bikê û wê werênê ser ziman bê.

Di dewama wê de mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê çand û civak wê, pêvajoyên wan ên pêşketinê wê, di wê çerçoveyê de wê, hevdû afirandina wan wê temen û rengê jîyanê wê biafirênê. Çand wê mijarên weke kevneşopî, orf, adet û hwd ku wê weke awayna rengê jîyanî ên civakê wê biafirênin wê di nava wê de wê wer ziman. Lê li vir wê ji aliyekê din ve jî wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê di nava têngîna çandê de wê salixkirina şubje û şubjeyan bi têngîni û salixkirina wan û hanîna ser ziman wê weke aliyekê fahmkirinê ê epistemolojikî ê bi wê re wê jî wê biafirênê.

Cassirer wê dema ku wê bi civakê re wê bi çandê wê bihizirê wê bi pirsra 'mirov çi ya' re wê dest bi hanîna ser ziman wê bikê. Çand wê di wê çerçoveyê de wê çerçoveya fahmkirinê bi hebûnê û hemû objeyên jîyanê re wê bi watelêkirinê û hwd re wê bide fahmkirin. Di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê watelêkirinê û bi nirxkirinê ê fahmkirinê civakê jî bê çand. Wê di wê çerçoveyê de wê mirov dikarê wê weke aliyekê giring ê fahmkirinê bi jiyane civakê re wê mirov dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman. Di warê fahmkirina çandê de wê, di wê çerçoveyê de wê, dema ku mirov gotinek bi giştî wê bi wê re wê bêjê mirov wê karibê bêjê ku wê, hebûn û çerçoveya hemû fahmkirin, pêşketin, jîyan, serborî û hwd ên civakê bê.

Ji destpêka civakê ve çand û pêşketina wê

Ku mirov ji destpêkê ve hilde li dest wê çand wê weke têngîneka empistomolojikî a dagerî ku wê bi zêhnê mirov re wê hin bi hin wê pêşkeve bê wê mirov dikarê wê salixbikê û wê werênê ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê, têngîna çandê wê pêvajoyên wê yên pêşketinê di çerçoveya pêşketina mirov de wê dikarê wê, werênê ser ziman. Di nava dîroka mirov de wê, bi pêşketina mirov re wê hin bi hin wê xwe bide nîşandin. Wê di wê rewşê de wê, weke aliyekê giring ê ku mirov dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman bê.

Bi dîrokê re wê, pêvajoyên pêşketina çandî wê, heta demên destpêka bidest hizirkirina mirov û ankî hîskirina mirov wê herin. Wê minaq wê weke Cassirer wê di berhema xwe ya bi navê "*Symbol, Myth, and Culture*" de wê têngîna dagerîyê wê bi pêjnên weke naqşên wêneyî ên ku wê li hêtên şikeftan ku wê werina kirina re wê, werênê ser ziman.

Di aslê xwe de wê mirov dikarê wê weke aliyekê giring wê di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê çand wê di wê warê de wê weke danîşana zêhnê mirov ê ku ew pêşdikeve bê. Wê mirov wê bi demê re wê nîşanaka wê bê ku wê bidest hizirkirin û berî wê xiyalkirinê bikê bê. Ev wê weke aliyekê destpêkê ê fahmkirinê bê.

Di dewama wê de mirov diakrê wê werênê ser ziman ku wê çand wê, di pêvajoyên wê yên destpêkê de ku mirov ji çavkaniyên ku wê ji demên berê wê werina girtin dikarin hinekî bi wan jî bi wê bihizirin. Minaq wê hêkelên ji dema neolotikê, her wusa awayên pêşxistinê ên weke amûrên xwe parastinê ên weke çêkirina bivir, mazrabk û hwd wê, mirov dikarê bi wê re li wê bihizirê.

Di demên peleolitikê de wê, di wê çerçoveyê de wê mirovê ku ew di destpêkê de dihizirê wê di wê rengê de wê tiştan wê bidest çêkirinê bikê. Çêkerî wê aliyekê wê yê xwemalî ê çandî wê hebê. Di wê çerçoveyê de wê, weke têgîneka hûnerî a çandî jî bê.

Di pêvajoyên piştê ên çandê û pêşketina wê de wê, weke renekê jîyanê wê bi rengê avakirina malan, kedîkirina sawalan, pêşxistina çandiniyê û hwd wê weke aliyna çandî ên ku mirov dikarê bi wê bihizirê bê. Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê weke aliyekê wê yê giring wê werênê ser ziman ku wê, ev pêvajoya afirandinê wê piştî ku wê destpêka wê bibê wê bi demê re wê were dîtî ku wê hin bi hin wê li wê tişt wê werina zêdetir kirin.

Minaq çêkirina cûreyên xwarinê û hwd wê, di wê çerçoveyê de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman. amûrên weke sênîk, kevçî û hwd ku wê bi wan wê xwarin wê were xwarin wê tiştina çandî ên jîyanê dema şariştaniyê bin.

Wekî din wê di dewama wê de mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê çand wê ne tenê wê tiştên ku ew mirov wan li dûv hevdu pêşdixê û bi wan dijî re bê. Wê bi wê re wê dikarê bi rengê fahmkirina bi karhanîna tiştanê ankû amûrên jîyanê ên bi wan çandiniyê, xwarin xwarinê û hwd bê. Ev jî wê weke aliyekê fahmkirinê bi çandî bê.

Ji aliyekê din ve jî wê, mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê di pêvajoyên şariştaniyê de wê, têgîna çandî wê di wê çerçoveyê de wê hin bi hin wê pêşkeve. Çand wê weke awa û renekê têgînî ê bi rewşên jîyanê ên ku ew hatina jîyankirin re jî bê. Di wê çerçoveyê de çanda dîrokî û bi wê re pêşxistina dîroka çandê wê weke aliyên fahmkirina çandê ên ku ew li duv hevdu dihên pêşxistin bin.

Çand wê mirov dikarê weke têgîneka jîyanî a bi rengê jîyanê re ku wê ji xwe re wê weke du lingên ku ew bi wê pêşdikeve wê aqil û ziman bê. Wê di wê çerçoveyê de wê bi wan re wê çerçoveya xwe ya fahmkirinê wê biafirênê wê bide nîşandin. Mirov tiştan dibînê û bi wê re weke bi 'zanaatî' wê dikarê wê çêbikê. Mînaq wê pêşî wê mirov wê sawalan di nava jîyanê xwezayê de wê bibînê. Wê xiyalbikê. Wê piştire wê, sûretên wan li hêtên şikeftan wê bidest çêkirinê wê bikin. Wê di dewama wê de wê di nava jîyanê de wê bi hevdû re wê bi komî wê pêvajoyên jîyankirinê wê derbasbikin. Ev pêvajo wê bi mirovan re wê, hevdû naskirinê, fêrbûna bi hevdû re jîyanê, li hevdû hoyandina derûniyê û civaknasîyê û hwd wê bi wan re wê biafirênê.

Ku em di çerçoveya jîyane bi niştasihî de wê fahmbikin wê, çand wê weke temenekê xêvî, fahmkirin û naskirinê bi hevdû û hewirdore re wê biafirênê bê. Ber vê yekê wê çand wê weke aliyekê têgînî ê şubjeyî wê di wê warê de wê di jîyane mirov de wê weyn bileyizê. Di pêvajoyên jîyane civakî de wê, çand wê weke têgînek bi sazûmanî a ku ew temenê jîyanê diafirênê wê mirov dikarê wê werênê ser ziman.

Çand wê di çerçoveya fahmkirinê û gihiştina fahmkirina çerçoveya jîyane ku mirov de jî wê weke temenekê fahmkirinê bê. Pêvajoyên jîyane civakî wê, bi wê re wê temenekê wan hebê. Di demên berî-şariştaniyê de jî wê mirov dikarê bi wê re wê, bi awayekê fahmbikê. Di wê çerçoveya ku wê temenê pêşketina şariştaniyê wê biafirênê wê bi têgînên wê re ku wê temenê jîyanê bi nerînî wê bidest afirandinê bikê re bê. Di wê çerçoveyê de wê çand wê weke çerçoveyek fahmkirinê a bi nerînê re wê hin bi hin wê xwe bide nîşandin.

Di pêvajoyên fahmkirinê de wê, mirov wê bi wê re wê, bijî. Têgînên weke civaknasîyê, derûniyê û hwd wê, di nava jîyane çandî de wê xwediyê temenekê li hevdû hoyandî jî bin. Wê bi wê re wê, mirov dikarê wê bi wê re wê weke aliyekê giring wê fahmbikê û wê werênê ser ziman ku wê pêvajoyên jîyanê wê di çerçoveya çandê de wê bigihijina çerçoveyek fêrûazmûnî di jîyane mirov de. Ew jî wê temenê jîyane mirov biafirênê.

Mirov di nava jîyanê de wê, weke aliyekê giring dikarê çandê wê werênê ser ziman ku wê pêşketinên aqilî û destî û kirinî wê bi wê re wê werina ser ziman. Xêv wê di temenê van pêşketinan de wê weke temenekê şubjeyî wê biafirênê û wê bileyizê. Ber vê yekê wê çand wê çerçoveyek afrîner a bi zêhnî û jîrî wê bi wê re wê di nava jîyanê de wê bide afirandin. Pêşveçûnên bi aqilî ê di nava jîyanê de wê jîyanê de wê ji

aliyekê ve wê bi kirinê û dîtbarî bin. Wê dema ku mirov dibînê wê bidest girtin û çêkirina weke wan bikê. Wê çêkerîya weke wan jî wê bi hûnerê wê mirov dikarê wê fahmbikê. Ev hûnerî jî wê di aslê xwe de wê di nava pêşketina fahmkirina jîyane de wê temenekê pêşketinê ê bi çêkerîyan jî xwezayê wê biafirênê.

Çand wê ji aliyê hebûna civakê ve wê çerçoveyek heyînî a bi fahmkirinê wê biafirênê. Weki din wê di nava jîyanê de wê, çûnûhatin, kirin û têngînên me yên bi jîyanê ve girêdayî wê, di çerçoveya wê de wê weke aliyna ku mirov dikarê wê werênê ser ziman. Di nava jîyanê de wê, têngîna çandê wê, bi felsefîkî ku mirov wê hilde li dest wê ya 'rast' û 'nerast' wê di wê çerçoveyê de wê li gorî wê di navaroka wê de wê xwediyê wateyek temenî bê. Çanda civakê wê, ji aliyê civakê ve wê mirov çawa rast dibînê, têdigihê, fahmdikê, bi wê dijî û hwd wê bi wê re wê, werina ser ziman.

Di fahmkirina bi çandê re wê civak wê di aslê xwe de wê çerçoveya wê ya têngînî a civakî wê biafirê ku mirov dikarê wê bi wê re wê werênê ser ziman. Weke aliyekê din wê mirov dikarê wê di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê, rengê jîyan wê, bi wê re wê, were ser ziman.

Çand wê, di her qadên jîyanê de wê dema ku mirov tiştêkê ji xwe re bikê karê jîyanî û fahmbikê wê weke aliyekê wê yê çandî jî wê hebê. Çand wê, weke temenekê wê yê dînamîk jî wê hebê. Wê bi ahenge jîyanê û xate wê ya pêşketinê re wê, ew jî wê di wê de wê hin bi hin wê bi têngînî wê karibî gûharînê bi xwe re bide çêkirin. Di wê çerçoveyê de wê çand bi dîrokê re têkiliya wê ku mirov dênê wê bi têngîna fahmkirina jîyanê re bê. Di nava jîyanê de wê, çand wê weke têngîneka ku wê, çerçoveya wê ya fahmkirinê wê di nava jîyanê de wê bi serborî, vegotin, çîrok, wêja, hûner û hwd re wê, were ser ziman. Wê di wê çerçoveyê de wê cihane civakê wê, bi çerçoveya wê re wê, biafirênê û wê pîrsgirêkên wê yên jîyanî wê ji wan re wê bi rêgezî bikê ku ew ji wan re şîrove û ankû fahmkirinê werênê bê. Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê weke aliyekê giring wê werênê ser ziman ku wê rewşa fahmkirinê wê, di wê çerçoveyê de wê, dema ku wê bi çandî wê were kirin wê, di wê de wê bi têngînî wê armanca wê gihandina li têngihîştinekê bê. Di vegotin, çîrok, wêja û hwd de wê, aliyekê wan ê ji wan fêr derxistinê wê bi têngîna çandê re wê hebê. Wê di wê çerçoveyê de wê mirov wê çawa wê têbigihê û wê fahmbikê û ankû çawa raast a ku ew bi wê were fahmkirin û hwd wê bi wê re wê, weke aliyekê ku wê li ser wê bisekinê bê.

Di wê çerçoveyê de wê çand wê, bi têngîna mejuyî wê, di wê hanîna ser ziman de wê, weke şûnpe û ankû paşaroja dema bûhûrî a civakê bê. Çand wê di demên berê de wê dema ku wê bahsa wê were kirin wê bi serborîyan re wê were ser ziman. Di dewama wê de wê çand wê, di wê wê yên berê de wê bi devkî û hwd wê di wê çerçoveyê de wê weke ku wê kurd di civatên xwe de wê li hevdû rûnihin û wê vebêjin wê bi wê rengê wê xwediyê awayekê pêşketinê civakî û bi çandî bi hevdû re parvekirinê bê.

Di mijare fahmkirina çandê de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê di wê çerçoveyê de wê, çerçoveya wê ya fahmkirinê wê, bi wê re wê mirov dikarê wê werênê ser ziman. Di nava civakê de wê, bi çandî wê dema ku wê vegotinek, çîrokek û hwd wê were vegotin wê ji aliyekê ve wê çendî ku wê bi serboriyek ku ew hatî vegotinkirin û ankû çîrokkirin re ku wê were vegotin jî lê wê bi rêgezî wê armanca wê gihandina li rêgezê fahmkirinê a rast bê. Wê, di wê çerçoveyê de wê, di nava 'ya baş' û 'ya nebaş' de wê sînorekê wê bi wê re wê dênê. Wê bi wê re wê çawa ku wê bijî wê ya nebaş wê weke encam wê bibê û çawa bijî wê ya baş wê bibê wê weke çêkirina bi fahmkirinê temenekê wê jî bê.

Max Weber wê çandî wê bi çerçoveya gotina 'zanistê' re wê bikê ku wê werênê ser ziman. Ku em wê weke zanistê wê herêbikim em divê ku wê weke zanista civakê wê di wê çerçoveyê de wê fahmbikim û wê werênina ser ziman. Di aslê xwe de wê di wê çerçoveyê de wê, ji aliyê felsefeyî ve wê çand wê weke ku wê çawa wê felsefe wê bi têngîna 'arkhê' re wê li li pirsgirêka temenê wê bihizirê wê, aliyekê têngîna çandî a felsefeyê bi fahmkirinê jî wê di wê rengê û awayê de wê hebê. Felsefeya çandê wê armanca wê di serî de wê ew bê ku wê çerçoveyek hevîrtî a bi fahm a çandî bi rêgezîkirin û teorîkirina wê re wê pêşbixê û wê dênê berfahma civakê.

Di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê wê yê giring wê di serî de wê mirov dikarê wê weke aliyekê wê yê giring wê di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê felsefeya çandê wê, di aslê xwe de wê, temenê wê li ser esasê fahmkirina navaroka çandê û têngîhiştina wê bê. Di wê çerçoveyê de aqilekê kirinî ê felsefeyî wê bi têngîna çandê re wê di nava jîyane civakê de wê xwe bi awayekê wê bide nîşandin.

Em li ser wê têngîna aqilî a kirinî a çandî re ku em bihizirin wê di wê çerçoveyê de wê, çerçoveyek fahmkirinê wê bi wê re wê, xwe bi awayekê wê bide nîşandin. Aqilê felsefeya çandê wê di serî de wê

çerçoveyek fahmkirinê wê bi mejuya civakê a bi rengê jîyane wê re wê ji xwe re wê bikê armanc ku wê pêşbixê. Wekî din wê çawa wê fahmbikê û wê çawa ew divê ku ew were fahmkirin wê, li ser wê bisekinê.

Têgînên ku em di çerçoveya felsefeya çandê de wê hildana li dest ên weke bi rengên fahmkirinên weke romantismê û hwd re ku wê pêşkevin wê di wê çerçoveyê de wê çerçoveyek fahmkirinê a jîyanê bi rengê wê re wê bi dîmenbikê û wê bikê ku wê werênê li berçav û bi me bide fahmkirin. Di dewama wê de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê weke aliyekê wê yê giring wê werênê ser ziman.

Mijare çandê bi têgihîştin û hişmendîya wê re wê weke mijarek kûr a bi fahmkirina jîyane civakê û rengê wê re ku mirov dikarê wê hilde li dest, fahmbikê û wê werênê ser ziman bê. Di dewama wê de wê weke aliyekê wê yê giring wê ev wê bi wê re wê, weke aliyekê wê yê giring wê, ew çerçoveya jîyanê wê di wê çerçoveyê de ew ji kîjan temenê afirîya, çawa afirîya bi element, argûman, û dîyardeyên wê re wê bikê ku wê fahmbikê.

Di warê fahmkirina çandê de wê mirov dikarê wê di serî de wê werênê ser ziman ku wê salixkirinên bi çandî re wê, weke aliyekê giring ê fahmkirinê wê biafirênê. Li ser temenekê dîrokî û fahmkirina wê re wê, hanîna ser ziman bi rengên wê yê pêşketinê û awayên wê re wê karibê temenekê baş ê fahmkirinê wê werênê ser ziman. Di warê têgîna çandê de wê mirov dikarê wê weke aliyekê giring wê bi wê re wê fahmbikê ku wê dîroka civakê wê dema ku wê were ser ziman wê, aliyên wê yên bi rêveberî û hwd wê tenê wê aliyekê wê yê ku ew bi wê re diafirênin bin. Lê aliyê ku wê weke aliyê esasî û temenê wê diafirênê wê, rengên wê yên jîyanî bê. Pêvajoyên destpêkê ên şariştaniyê ên mîtolojîkî û piştî ên felsefeyê wê, di warê fahmkirinê û rengê wê de wê di awayekê de wê, karibê temenekê fahmkirinê biafirênê. Li vir wê, weke ku em çawa bi têgînên baweriyê ên bi olê re wê, weke bi olzaniyê re wê, bi rengên weke jîyane olzanî ku ew dihê ser ziman wê di rengê çandî de wê li şûna wê, têgînên weke yên çîrok, vegotin û hwd wê biafirênin.

Di awayekê fahmkirina çandê de wê, di serî de wê ji wê yekê wê were fahmkirin ku wê awa û rêbaz wê weke aliyekê giring wê, xwe bide nîşandin. Minaq wê, di wê çerçoveyê de wê, rengê hildana li dest wê, bi teorîkî û felsefîkî ku wê were kirin wê, di wê çerçoveyê de wê, ne bi rengê dogmayan lê bi awayê pozîtiv û temenekê bûjenî wê fahmkirina wê hildana li dest û derxistina li têgihîştinê wê, weke aliyekê giring bê. Aliyê wê yê bi têgînên weke baweriyê û hwd re wê werina ser ziman jî mirov, dikarê weke aliyekê din ê weke mijare derûnîya civakê jî wê dikarê wê

werênê ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê, pirsên di derbarê jîyanê, destpêka wê û herfîna wê û hwd ve wê di mejiyê mirov de wê temenê baweriyê û hwd wê biafirênin.

Pêvajoyên rengên jîyankirina çandî wê, di wê warê de wê, temenê wê li ser esasê fahmkirinê ê bi rengê salixkirina wê ya li ser serborîya wê re wê were ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê, bi felsefeyê, û hemû cûreyên din ên aqil ku wê çawa wê were hizirkirin wê di wê rengê de wê, aliyekê wê yê ku mirov wê dikarê wê, di wê rengê de wê, fahmbikê bê.

Mijare çandê wê dema ku wê hilde li dest wê, di wê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê rêbaz wê weke aliyekê giring wê mirov karibê wê hilde li dest bê. Felsefeya îdealîzmê ku wê bi têngînên 'apriorî' wê biafirênê wê, di wê çerçoveyê de wê, ev wê felsefeyê wê çerçoveyek hizirkirinê a fahmkirina hesanî û rojane û bi fahmkirina wê re ku mirov bigihijê wê, dûrbikê. Wê bi serê xwe wê, têngînek *metafizîkî* wê bi xwe re wê ji xwe re wê bikê temen û wê li ser wê re wê were ser ziman. Di wê warê de wê, dema ku mirov wê bi wê rengê felsefeyê li wê bihizirê wê bêgûman wê, çandê wê, ji rewşa wê ya fahmkirinê wê derxê. Wê weke têngînek ser mirov re wê, bide çêkirin. Her wusa wê ji temenekê ku wê bi jîyane mirov, fêr û azmûnên mirov re pêşdikeve wê dûrbikê. Wê ber wê yekê wê, bi tememî wê weke ku wê çandî wê di fahmkirina wê de wê karibê bi awayekê bi serjêkirî de jî wê bikê.

Ev jî wê, di wê çerçoveyê de wê, çandê wê di rewşek fahmkirinê de wê, di awa û darêjkek baweriyê û hwd de wê bide dîyarkirin.

Di mijare fahmkirinê de wê ku em bahsa çandê civakê bikim wê bi jîyane civakê re wê, fahmbikê wê di wê çerçoveyê de wê ya rast bê. Di wê rengê de wê çand lê wê mijarek berfireh bê. Wê aliyên derûnî jî, civaknasî jî, dadî jî, ên aqilî weke felsefeyê û hwd jî wê bi pêvajoyên wan ên jîyankirî wê karibê weke bi têngîna 'çandek afirî' de wê, hilde li nava xwe û wê werênê ser ziman. Çand wê, di wê rengê de wê, weke qalibekê giştî ê civakî û bi sazûmanî ê fahmkirinê wê di dîmenekê de wê xwe bide dîyarkirin li berçav.

Di mijare fahmkirina xwezayê de wê ti destûrên negûharîner wê nebin. Wê hemû tişt wê di çerçoveya têngîn û destûrek gûharîner de wê, were hildan li dest. Di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê wê yê giring wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê rewşên xwezayê ên ku ew dem bi dem bi wê gûharînê re diafirin wê, derxistina wan a li hişmendiyê wê aliyekê temenî ê fahmkirina rengên aqil û têngînên çandî ên civakî jî wê biafirênê. Jîyane civakê wê, temenê wê xweza, derfetên ji wê û jîyane bi

wê re wê ji wê biafirê. Di wê çerçoveyê de wê xweza wê weke aliyekê wê yê fahmkirinê wê xwe di awayekê de wê bide diyarkirin. Xweza wê, têkiliya wê ya bi civakê û jîyane wê re wê temenekê gûharîner ê weke temenê xwezayê ê gûharîner bê. Di wê çerçoveyê de wê, di serî de wê weke aliyekê giring wê di serî de mirov dikarê wê weke aliyekê giring ê fahmkirinê jî wê bi wê re wê hilde li dest û wê werênê ser ziman.

Çand û aliyên wê yên bi jîyane civakê re ên bûjenî û kirdeyî

Ku mirov ji kîjan aliyê ve hilde li dest wê çand wê weke aliyekê pêşketina civakê a zêhnî wê biafirênê. Di warê çandê de wê, fahmkirina wê ya bi aliyên wê yên bûjenî û kirdeyî ve wê weke aliyekê giring ê fahmkirina wê jî wê biafirênê. Aliyê çandê ê bûjenî wê bi aliyê pêşveçûnên bûjenî ên jîyane me ve girêdayî wê mirov dikarê wê fahmbikê. Di wê çerçoveyê de wê aliyên bûjenî wê, bi kirin, tiştên bi bûjenî pêşxistî, reng û awayên ku ew dihên çêkirin û hwd wê hilde li nava xwe. Ji vê aliyê mirov dikarê gelek aliyên wê yên ku ew bi jîyanê ve girêdayî wê werênê ser ziman. Di aslê xwe de wê hemû aliyên jîyane me a bûjenî wê di wê çerçoveyê de di çerçoveya fahmkirinek kirinê de wê dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman.

Aliyê çandê ên kirdeyî û ankû mirov dikarê bi gotina 'menewîyetê' re jî wê werênê ser ziman wê aliyê hizrî, têgînî, baweriyî, derûnî û hwd jî wê hilde li nava xwe. Di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê ku mirov wê dikarê wê bi aliyê hizirkirinê û afirandina wê re wê werênê ser ziman. Aliyên vegotinî, çîrokî û hwd wê di wê çerçoveyê de wê weke aliyna fahmkirinê ên ku mirov dikarê wan werênê ser ziman. Di aslê xwe de wê, ev herdû alî wê jî wê weke aliyna kûr bin. Mirov dikarê di wê çerçoveya wan de wê weke aliyekê giring wê, di serî de wê, bi temenî dikarê wê fahmbikê.

Di nava jîyane me de wê aliyên ku em 'weke li gorî wan dijîn' wê, orf û adet, kevneşopî û hwd wê weke aliyna ku mirov karibê li vir wan bikirpênê bê. Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê weke aliyekê giring wê bi têgîna çandê a aliyê şûbjeyî ê civakê re wê bi hizirkirina wê re wê, afrînerîya wê ya bi têgînî û ankû têgihîştinî jî wê werênê ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê ev alî wê weke aliyekê ku wê fêrûazmûnên me yên di jîyanê de ku me pêşxistina û ankû derbaskirina wê di temenê wê de wê hebin.

Di nava jîyanê de wê, mirov wê, piştî ku wê bidest hizirkirinê wê bikê û pê de wê bidest afirandina bi hizirkirinê wê bikê. Di dewama wê de wê

weke aliyekê giring wê di serî de wê mirov dikarê wê weke aliyekê giring wê di serî de wê werênê ser ziman bê.

Mijare aliyê kirdeyî wê weke aliyekê rewşenbîrî û hwd bê. Wê di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê bi hizirî wê afirandinê û hwd wê hilde li nava xwe. Wê di wê çerçoveyê de wê, civak wê bi wê re wê xwediyê mejiyekê hilberîner ê fahmkirinê bê. Di nava wê de wê, weke aliyekê din jî wê, bi fahmkirina hewirdorê û ji wê derxistina bi hizran û hwd re wê, fahmkirina wê xwe bide pêşxistin. Di wê çerçoveyê de wê aliyekê têgînî ê çandî yê kirinî bi hizirkî wê bi xwe re wê bide nîşandin.

Di dewama wê de mirov dikarê wê jî wê weke aliyekê din wê werênê ser ziman ku wê mijare fahmkirinê a çandê wê, bi wê rengê wê, aqilê çandî ê kirinî wê nbi awayekê pozitivist wê di temenê pêşketinên xwe yên weke bi hûnerê û hwd re de jî wê karibê bide nîşandin. Têgînên hûnerî û hwd ên weke bi romantismê, rayonalismê, surrealismê û hwd wê, di wê çerçoveyê de wê weke aliyna ku mirov dikarê wê hinekî wê hilde li dest. Çand wê, di wê warê de wê, aliyê civakê ê têgînî wê bi xwe re wê bide nîşandin. Civak wê bi gotinên xwe wê dema ku wê dihênê ser ziman wê bi gotina 'gîyane min' û ankû 'rûhê min' re wê werênê ser ziman.

Di wê çerçoveyê de wê civak wê di nava xwe de wê, hertimî wê pêwîstî fahmkirinê a bi xwe re wê hebê. Di dewama wê de wê weke aliyekê giring wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê çand wê weke berheviya wê ya bi têgînî a ji hemû aliyên wê ve ku wê weke çerçoveyekê bê wê, di temenê wê pêşketina wê ya bi ber pêşarojê ve wê, weke temenekê afrîner jî wê karibê xwe bide nîşandin bê. Di wê çerçoveyê de wê, aliyê çandî ê weke wê jîyankirinê wê weke aliyekê civakî ê bi rengê jîyanê bê. Di wê çerçoveyê de wê, çand wê, di roja me de wê di derbarê wan de wê gelek têgînên ku wê ji aliyên bûjenî û kirdeyî ve wê wan hildina li dest wê pêşkevin. Mînaq gotinên weke çanda kirdeyî û ankû çanda menewî wê, weke aliyekê ku wê, di wê çerçoveyê de wê di temenê fahmkirina hizrên xwe yên baweriyê û hwd re wê were hildan li dest. Dîroka civakê a di demên wê yên destpêkê ve wê temenekê wê yê bawerkirinê wê hebê. Li ser wê re wê, sazûmanak hizirkirinê wê biafirên. Her çendî ku wê ew têgînên wê, weke 'ji jîyanê qût' wê werina dîtî jî lê wê ji aliyekê ve wê çavkaniya wan wê jîyane ku ew di wê de dijîn jî bê. Her tişt ku ew bi têgînî a çandî bikirdeyî û ankû bi bûjenî bê wê di nava jîyanê de wê were jîyankirin. Wê dema ku ew di nava jîyanê

de were jîyankirin wê weke aliyekê giring wê xwe di wê çerçoveyê de wê bide nîşandin.

Civak wê bi herdû aliyan jî wê pêwîstîya jîyankirina wê hebê. Ya ku wê dikê civak jî wê di aslê xwe de wê ji aliyekê ve jî wê ev bê. Ti civak nîna ku ew tenê bi aliyê bûjenî dijî. Yan jî mirov dikarê bi wê rengê bêjê ku wê ti civak nebê ku ew tenê bi aliyê kirdeyê û ankû menewî wê bijî. Di wê çerçoveyê de wê di nava wan herdû aliyan de wê çawa wê ahengekê wê çêbikê û wê belansekê wê bide çêkirin wê di nava hewldana wê de bê.

Bêgûman wê kesên weke endamên civakê wê di nava wê de wê bi çûnûhatinên xwe û pêvajoyên xwe yên afirandinê re wê, civakê wê, di wê çerçoveyê de wê, ji aliyekê ve wê, bi pêşketina civakê ve jî wê mirov dikarê wê werênê ser ziman. Kesên ku ew civakê diafirênin mirov in û mirov jî wê xwediyê jîyanekê bin. Ew jî bo ku wê jîyane xwe bidina domandin wê pêwîstîya wan bi tiştên xwe bi wê jîyankirinê wê hebin. Wê di wê çerçoveyê de wê tiştên ku ew weke tiştên xwe bi wê jîyankirinê wê tiştên weke zad ên xwarinê, mal cihên weke sitargehê û têkiliyên zayendî ên weke xwe domandinê bin. Wê ev sê ali wê weke aliyna civakî bin.

Di wê çerçoveyê de em dema ku pêvajoyên şariştaniyê ên ji destpêkê, minaq ji demên sumerîyan û hwd li wan dinerin wê mirov dibînin ku wê ji van aliyan ve wê, şirovekirin wê werina pêşxistin. Wê ev wê weke aliyna giring ên ku mirov dikarê wê, di serî de wê, weke aliyekê giring wê dikarê wê werênê ser ziman bê.

Di nava civakê de wê, çawa wê nbi hevdu re wê bijîn, wê rengê têkiliya wan wê çawa bê, tiştên ku ew bikin wê çî bin û yên ku ew nekin wê çî û çawa bin wê, di wê çerçoveyê de wê ji aliyekê ve wê weke aliyna ku wê di nava jîyane civakê de wê, werina dîyarkirin bin. Wê di wê çerçoveyê de wê ew rengên ku ew hatina dîyarkirin wê bi destûrên weke yên kevneşopî û hwd re wê werina dîtin. Wê di wê çerçoveyê de wê minaq têkiliyên nava zayendan, minaq weke jin û mer, mirov dikarê wê minaq wê bidê. Di nava kurdan de wê kevneşopîya hemawîyê wê hebê ku wê weke têgîneka ku wê temenê sererastkirina têkiliyên nava jinê û mêrê de jî ku wê bide kirin bê. Di wê çerçoveyê de wê bi wê destûrê re wê, jin wê weke nirxek pîroz a afrîner a jîyanê û ankû weke temenê jîyanê jî wê were dîtin.

Di dewama wê de wê pêvajoyên jîyane civake kurd ku mirov ji van aliyan ve wê hilde li dest wê gelek aliyên giring ê mirov dikarê wan di serî de kifşbikê û wan werênê ser ziman wê hebin.

Pêvajoyên fahmkirinê wê di wê çerçoveyê de wê, di çerçoveya fahmkirina têkiliyên nava endamên civakî bi zayendî, çînî û hwd re wê, xwe bidina nîşandin. Di wê çerçoveyê de wê minaq têkiliya nava yekî dewlemend û yekî xizan de wê çawa bê. Wê çawa wê nêzî hevdû bibin. Di nava kurdan de yekê dewlemend ku ew yekê xizan haqîr bibînê û wî piçûk bibînê wê ew weke bêrûmetîyekê jî wê ji wan re wê were dîtin. Di wê çerçoveyê de wê têgînên çandî ên ku ew hena wê bi wan re wê çawa wê di nava têkiliyek bi wate de bin wê di wê warê de wê temenê fahmkirinê wê were ser ziman.

Di nava civakê de kurd wê weke kevneşopîyek bi hezaran salan wê, hîyararşîya bi rêzgirtinêa ji yê piçûk bi ber yê mazin weke zaro li hemberî dêûbav, dêûbav li hemberî dapîrûbapîran û hwd wê were ser ziman. Wê, di wê çerçoveyê de wê, ev wê weke têkiliyek ku wê di wê çerçoveyê de wê, hertimî wê bi rêz û hûrmet wê, were pêşwazî kirin bê. Minaq mirovekê ku wê bêrêzî li dijî dêûbavê xwe kir wê, weke *kesekê bêrêz* wê were naskirin û wê di nava civakê de wê hertimî wê lê rexne wê werina girtin. Bi wê rexnelêgirtinê re wê bê xwestin ku ew wan aliyan xwe sererastbikê û li hemberî mazînen xwe bi rêz û hûrmet bê.

Di wê rengê û awayê de wê ev wê weke aliyna giring ên ku mirov dikarê werênê ser ziman bê. Ev alî wê weke aliyna jîyanî bin. Wê di nava kevneşopîyên wan de wê, ji hemû aliyan ve wê, bo her temenê mirov jin û mêr wê, salixkirinên bi destûrî wê hebin. Wê ti kesek wê dernekeve dervî wan. Wê di wê çerçoveyê de wê ew wê weke aliyan ji bûyîna civak jî wê werina dîtin û wê bînan hanîn ser ziman. Di dewama wê de wê mirov dikarê wê weke aliyekê din jî wê werênê ser ziman wê mijare têkiliyên nava jin û mêr bê. Wê, di wê warê de wê weke aliyekê giring wê ev derkeve li pêş. Di wê çerçoveyê de wê, mijare fahmkirinê a di wê çerçoveyê de wê, jin wê weke temenekê pêşxistina zaroyê bi çand û zimanê wê re wê were dîtin. Dema ku zaro mazin dibû lê dihat nerîn ku ew ji wan aliyan ve temem bû wê hingî wê weke ku wan erka xwe hanîya cih wê lê bînerîyan û wê jê bahsbihata kirin. Lê dema ku ew ne hatîba hanîn li cih wê weke kesna nezan wê, heta dawîya jîyane xwe û piştî mirna xwe re wê bihetan naskirin û wê ji wan biheta bahskirin.

Aliyekê din ê çandî wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ser ziman ku wê mijare çandê wê di wê çerçoveyê de wê weke aliyekê din ê bi

nêzîkatîya li hemberî hevdu wê biheta dîtin. Aliyê çandî wê weke aliyekê bi civakbûn û ankû li gorî wê tevgerîn wê biheta dîtin. Di mijare fahmkirina çandê de wê, di wê çerçoveyê de wê weke ku em li kurdistanê di demên wê yên berê û heta ku î ro de jî wê dibênin wê, kevneşopî wê di wê çerçoveyê de wê di awayekê destûrî a civakî de wê li wê biheta nerîn. Wê di wê çerçoveyê de wê, herkesek jî wê di wê warê de wê bi zane bê. Wê bi fahmbikê. Wê bi têgihiştin û hişmendî bê.

Çand wê di wê çerçoveyê de wê ji aliyê civakê ve wê hildana li dest wê, weke aliyekê giring ê fahmkirinê wê xwe bi wê re wê bide nîşandin. Di dewama wê de wê weke aliyekê wê xwe bide nîşandin. Mijare fahmkirina çandê û hebûna civakê bi hevdu re wê, weke çerçoveyek bi wê jîyankirinê wê bi wê re wê lê biheta nerîn. Di wê çerçoveyê de wê, bi wê re wê jîyane xwe wê di wê çerçoveyê de wê, bijîyan.

Dîroka civakê me hinekî li jor wê hanî ser ziman. Lê di aslê xwe de wê gelek aliyên ku mirov bi wê ve girêdayî dikarê werênê ser ziman wê hebin. Di dewama wê de mirov dikarê wê weke aliyekê fahmkirinê ê bi têngîna çandê re jî wê di temen de wê hilde li dest. Ber ku wê mijarên çandî wê di wê çerçoveyê de wê, di çerçoveya gotina çandê de ku mirov wê weke ku wê ji wê fahmbikê jî wê weke aliyekê giring ê bi têngîna ya hatî jîyankirin re wê di kurdî de wê were ser ziman. Gotina çandê wê, wekî din wê wateya ya ku ew bi jîyanî were çandin bê wê were ser ziman. Di kurdî de wateya gotina çandiniyê wê bi çandiniyê, pêşxistinê, afirandinê û hwd re wê were ser ziman. weke wê bi gelek wateyên din re jî wê mirov dikarê wê werênê ser ziman.

Çand û têngîna nasnematiyê

Ku mirov bahsa civakê bikê wê di serî de wê, çandê û fahmkirina çandê de wê bahsa çandê weke rengê civakê jî wê were kirin. Di wê çerçoveyê de wê çand wê, weke qarakterê civakî, dîrokî û têgihiştinî jî wê were dîtin û ser ziman. Di aslê xwe de wê çand wê, dema ku mirov wê werênê ser ziman wê, di wê warê de wê, bi xwe re wê, di awayekê de wê rengê pêşketina civakê wê bide nîşandin. Her wusa bi pêşketinên wê re wê, li er pêşveçûnên bi fêrûazmûnî wê pêşketinên demên piştre jî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin.

Mijare çand û nasnemayê wê di awayekê weke ku em ji rengê pêşketina civakê û fahma wê fahmdikin wê weke awayekê têngîni jîyanî jî wê bi xwe re wê, xwe bide nîşandin. Di nava civakê de wê, gelek kom, zayend, çîn û hwd wê hebin. Di wê warê de wê, nasnema wê weke rengê

wê yê ku ew bi wê dihê naskirin jî bê. Di wê çerçoveyê de wê bi çandê û civakê re wê dema ku mirov bahsa têngîna nasnematiyê bikin wê, ziman wê weke aliyekê giringê temenî wê bi hebûna xwe ya giştî a civakî re wê biafirênê. Di wê rengê de wê, weke aliyekê giring wê mirov dikarê di serî de wê fahmbikê.

Têngîna çandî a nasnemayî wê di wê warê de wê, di demên hemdem de wê bi zêdeyî wê pêşkeve. Wê di dewama wê de wê weke aliyekê ku wê xoslet û rengê pêşketina me jî wê bide nîşandin. Minaq kesekê weke bijîşk ku perwerde dîtîya û wusa pêşketîya wê wusa weke bijîşk wê were nasîn. Kesekî weke endezyar, kesekê weke civaknasvan, kesekê weke derûnvan. Kesekê weke ramyarîvan û hwd wê, di wê çerçoveyê de wê, ji aliyê çandî ve wê bi wê rengê xwe pêşketinekê ku wê ji wan re wê bi têngînek nasnemayî jî wê were ser ziman bê. Wê di wê çerçoveyê de wê, minaq kesekê rewşenbîr wê bi wê re wê, were naskirin. Di wê rengê de wê ev wê weke aliyekê ku wê bi wê re wê were naskirin. Di warê têngînên fahmkirinê ên aqadamîkî û hwd de wê têngîna nasnemayê wê di wê rengê û awayê de wê bi navê nasnemaya çandî û hwd re wê, xwediyê wateyê û hanînek ser ziman bê.

Nasnema wê hinekî wê ji aliyekê ve wê, aliyekê aîdîyetî wê bide nîşandin. Wê dema ku minaq ez kesekê kurd bim û ji civake kurd bim wê bi wê re ew ji min re weke nasnemayekê were nasîn. Wê di wê rengê de wê ew ji min re wê bê nas. Ev di hemû rengên din ên pêşketinê ên civakî, rewenbîrî û hwd ên li deverên cûr bi cûr ên cihanê jî wê wusa bê. Di wê warê de wê, nasnemayên civakî wê, di wê warê de wê dema ku mirov wê bahsa wê bikê wê, di wê rengê de wê mirov karê wê werênê ser ziman.

Lê minaq wê di nava civakê de wê, çendî ku wê nasnema wê rengê mirov û naskirina mirov wê bi xwe re wê werênê ser ziman wê di roja me de wê mirov dikarê bahsa pirnasnematiyê bikê. Di wê rewşê de wê, kesek wê bi awayekê pirnasnemayî wê karibê bi xwe re wê werênê ser ziman. Minaq kesekê wê hem karibê ji çînekê bê, ji zayendê bê û ji civakekê bê. Wê, di wê rengê de wê ew ji wê re wê bina weke rengna nasnemayî. Wê di wê çerçoveyê de wê, awayê pirnasnemayî wê di wê rengê de wê weke xosletkê fahmkirin û jîyane demên hemdem jî wê pêşkeve.

Di roja me de wê, nasnema wê, ji gelek aliyan ve wê, weke sînorna nava mirovan jî wê werina dîtî. Minaq weke sînorê têkilîdanîne û ankû çûyina cem hevdû jî wê were dîtî. Minaq kesekê misilman, xiristîyan, cihû wê zêde wê, newina cem hevdû. Wê bi heman rengê wê bi

baweriyên din re jî wê werina dîtin. Wê bawerîya xwe wê ji xwe re wê bikina sînor. Wê di wê çerçoveyê de wê ew rengê nasnemaya bawerîyî a van bê.

Ji aliyekê din ve jî wê, di roja me de wê pirsgirêka nasnemayan mirov dikarê wê ji du aliyan ve wê, fahmbikê û wê werênê ser ziman. Aliyê pêşî wê, bi rengê weke ku me di wê rengê de wê hanî ser ziman bê. Aliyê din jî wê mijare nasnemayê ku wê bi aliyê serdestî û bindestiyê re wê were şîrovekirin. Wê di wê çerçoveyê de wê, yê serdest ku ew bi têngînek netewî bê û ankû bi awayekê din ve wê, xwe weke 'yê meşrû' wê bibînê. Wê bi wê re wê, yên din bi nasnemayî wê înkâr bikê. Wê hewlbide ku wan ji xosletên wan dûrbikê. Di wê çerçoveyê de minaq li rojhilat li îranê, sûrî, îraq û tirkiya wê, di wê çerçoveyê de wê çawa wê, nasnemaya kurdan û navê wan ji hemû aliyan ve wê tûnabikin û wê, ji dîrokê bibin û wê nehêlin ku di nava ti bineterên nivîskî de were ziman wê hinekî jî wê bo wê armancê bê.

Wekî din wê weki din wê bi zorê li wan kirina rengê nasnemayî û bi wê re bi zorê wan hanîna ser ziman wê weke aliyekê din ê bi têngîna nasnemayê re bê ku mirov dikarê wê li ser wê bisekinê bê. Minaq wê zimanê kurdan wê qadaxabikin ku ew bi wê biaxifin û xwe perwerde biikin. Wê bi navê wan wê ti dibistan wê li ti deverê wê nehêlin ku ew werina vekirin. Di dewama wê de wê, di nava sînorê tirkiya wê de wê weke 'tirk' û ankû 'tirkiyayî' wê werina ser ziman. Bi heman rengê wê li îraq, sûrî û îranê jî wê bibê. Ev şêwayê înkara nasnemaya kurd wê, weke aliyekê ku wê di temenê şerê van rejiman ê bi civake kurd re jî wê di her demê de wê biafirênê jî bê.

Di wê warê de wê pirsgirêka nasnemayê û bi wê re xwe hanîna ser ziman wê di wê çerçoveyê de wê di demên kapital de wê weke aliyekê temenî ê bi pirsgirêkî ku mirov dikarê wê ji temen ve weke prisgirêkek jîyane civakên herêman û beşên civakî ên nava wan ku ew dijîn bin werênê ser ziman.

